Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 380 nameronahi@gmail.com 13 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Erdê Kobanê ji bo çandiniyê bi berekete



Di rewşa ambargoya li ser herêma Rojava-Bakurê Sûriyê hatiye ferzkirin de, şêniyên Kantona Kobanê baxçeyan diçînin û pêdiviya xwe ji sebzeyan bi cih tînin.

Li gorî berpirsyarên xebatên çandina baxçeyan, pêdiviyên navenda bajarê Kobanê û 300 gundên wê ji sebzeyan tê bicihanîn.

Îsal 30 donim erd bi kundir û bacanên reş li rojavayê Kobanê hatin çandin.

Her wiha geleki cûreyên sebzeyan li aliyê rojhilatê çemê Firatê nêzî bajaroka Qenaya jî tên çandin.

Piştî du mehan ji çandina şitlên kundir û bacanên reş, cotkar berhemên xwe kom dikin...*ANHA*

## Generalên Apê Musa li her derê ne



Belavkarên Rojnameya Rojev a Mexmûrê hem dibistanê dixwînin hem jî belavkariyê dikin.

Destpêka belavkariya rojnameyên çapemeniya azad li Bakurê Kurdistanê bi generalên biçûk ên Apê Musa destpêkirine. Di dîroka çapemeniya kurdî de, her dem belavkarî bûye lingê sereke û hewildaye xwe bigihîne hemû malan. Piranî rojnamegerên çapemeniya azad bi belavkariyê destpêkirine. Ji salên 90'an heya niha her ku êrîş ser çapemeniyê kirine, destpêkê belavkar hedef girtine. Gelek caran di koşeyên kolanan de, zarokên belavkar ji aliyê polîsên Tirk ve rastî gefên kuştinê hatine, lê dest ji karê xwe bernedane.

Zarokên niha li Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûrê) belavkariyê dikin ji dîrokê hayîdarin. Ew dizanin bi kîjan bedelan ev kar hatiye heya niha, bi wê hişmendiyê berdewam dikin. Ew hem xwendekarên dibistanê ne hem jî belavkarên Rojnama Rojevê ne. Belavkarên Rojnameya Rojev a Mexmûrê li gel xwendina dibistanê jî tên belavkariyê dikin.

Ji belavkarên Rojnama Rojev a Mexmûrê Rengîn Kanit hîna 11 salî dest bi karê belavkariyê kiriye. Rengîn a 15 salî 4 salin li gel xwendina dibistanê belavkariya rojnamê dike. Rengîn her roja Înê weke peyîwirek pîroz dibîne, dema ku berê xwe dide deriyê avahiya rojnamê. Heya niha kesê jêre negotiye were, ji ber her ew bi xwe di saeta xwe de amade dibe...*ROJNEWS*



## Mezintirîn parka Reqayê tê amadekirin



Komîteya Xwezayê û Parkan dest bi xebatên paqijkirina navberiyan û Parka El-Beydai ya Reqayê ku mezintirîn parkên bajare kirin.

Çeteyên DAIŞ'ê dema herêm dagirkirin,herêm wêran kirin û binesaziya wê talan kirin. Li hemû taxên Reqayê xirabî û wêranî pêk anîn. Ji cihên ku çeteyan wêran kirin, parkên bajar bûn.

Komîteya Xweza û Parkan a Meclîsa Sivîl a Reqayê ji bo parkan careke din bixe bin xizmeta welatiyan dest bi kar û xebatan kiriye. Komîteyê dest bi paqijkirina parka El-Beydai ku mezintirîn parkên bajar e kir.

Komîte darên nû li parkê diçîne.

Di heman demê de kêmasiyên ku heyî jî radike, bi sîtêra heyî jî daran av didin. Hejmara karkerên di xebatên paqijkirinê de kar dikin jî kêm in, niha 12 karker dixebitin.

Endamê Komîteyê Mîzer El-Ehmed da zanîn ku ew bi hemû hêza xwe hewl didin ku rewşa bajarê Reqayê û xweşikbûna wî careke din vegerîn in û got ku tevî derfetên kêm ew bi hemû hêza xwe dixebitin.

El-Ehmed diyar kir ku ew ê xebatên xwe yên amadekirina parkan bidomîn in...*ANHA*

## QSD'ê dewreyên sûîqast û rakirina mayînan dawî kirin

Li akademiya Şehîd Feyad El-Şiblî û Şehîd Sarya Ronahî ya navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî du dewreyên perwrdeyê yên tîmên rakirina mayînan û sûîqastê hatin bidawîkirin.

Merasîma bidawîkirina dewreyê bi tevlîbûna fermandarên QSD`ê hate lidarxistin.

37 şervanên QSD`ê tevlî herdû dewreyên perwerdeyê bûn.

Di merasîma bidawîkirinê de yek ji fermandarên QSD`ê Kanî Ehmed axivî û bidawîkirina dewreyê li hemû şervanan pîroz kir û tekez kir ku ew ê heta dawiyê li gorî pîvanên disiplînê tevbigerin û parastina sivîlan bikin.

Ehmed da zanîn ku ewê heta dawiyê li hember hemû pêkhateyan erka xwe ya parastinê pêk bînin û got, ew ji hemû êrîşên li ser wan amade ne.

Paşê şervanên ku tevlî her dû dewreyên perwrdeyê bûn soza leşkerî dan û diyar kirin ku ew ê ji bo parastina hemû xaka Sûriyê erka xwe bi cih bînin.

Di dawiyê de belgeyên bidawîkirina dewreyê li hemû şervanan hatin belavkirin...*ANHA*



## Sûlav ji çopan xalî nabe


Sûlava ku li gundê Bêmbo yê Şemzînanê di nav hêşînahiyê de diherike, veguheriye çopgehê.

Li gundê Bêmbo yê Şemzînana Colemêrgê ku xwezayeke wê ya dewlemend heye, sûlava ku di nav hêşînahiyê de diherike veguheriye çopgehê. Ji ber çopan û bîna ji çopan tê mirov nikarin lê bimînin.

Hemû cureyên qirêjiyê li qada sûlavê hene. Li derdora sûlavê ku welatî ji bo hêşînahî û ava wê ji Şemzînan û navçeyên derdorê tên, ji walêz, ketil, şûşeyên plastîk, potikên zarokan, şûşeyên dermanan, pêlav, kîsik, çaydank, teneke û hwd. xalî nabe.

Sûlava ku ji çopan xalî nabe, li pişt wê şikeftek heye û her wiha ev şikeft jî bi çopan hatiye tijekirin.

Heta niha tu rayedarên şaredariyê û dewletê ji bo vê yekê tevnegiriyane. Gundiyên ku çopan dirijînin jî diyar dikin ku ji ber li gund tenekeyên çopê tune ne ew çopên xwe davêjin. Her wiha gundiyan destnîşan kir ku ji ber li Colemêrg, navçe û gundên wê tenekeyên çopê qedexe ne, li gundê wan jî tune ne...*MA*



# Mizgîn bû qêrîna azadiyê

***Komîteya Kevana Zêrîn di 26'emîn salvegera wê de fermandar û hunermenda şoreşger Hozan Mizgîn (Gurbet Aydin) bi bîr anî û diyar kir, "Mizgîn yek ji destanên destpêkê yên jinên azad ên Kurdistanê nivîsandiye."***



■ Komîteya Kevana Zêrîn wiha got, "Kesayetiya pir alî, hevgirtî û hunermend a hevrê Mizgîn, nîşaneya destanbûyîna jinên Kurd e. Ev hevrêya me ku bi dengê xwe bû qîrîna azadiyê ya hemû jinan û Kurdistanê, yek ji sembolên têkoşîna me ya azadiyê ye. Ew ne tenê lehengeke li Kurdistanê ye, ew lehengeke hunerê ye ku bûye dengê hemû jinan û şoreşgereke çandê ye. Em soz didin wan ku em ê li Kurdistana azad her tim xwedî li bîranînên wan derkevin."

■ Bi boneya salvegera şehadeta hunermenda şoreşger Hozan Mizgîn endamên çand û hunerê yên li rojavayê Kurdistanê jî diyar kirin ku wê hozan Mizgîn ji bo wan her tim bibe mînaka têkoşînê. Endamên TEV-ÇAND'ê wiha gotin, "Hozan Mizgîn nasnameya şoreşgerî ya hunera kurd e. Mizgîn mîrate û mînaka hemû jinên hunermende. Jinên Kurd yên hunermend li ser vê mîrateya Hozan Mizgîn huner û têkoşîna xwe pêşdixin."*R-7*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 380 13 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li dijî yek zimanî pirr zimanî

Hêzên dagirker û mêtinger yek ji polîtîkayên ku hertim serî lê didin û dixwazin pêş bixînin polîtîkayên asîmîlasyonîst in. Armanca bingehîn ji asîmîlasyonê ew e ku hemû amûrên berxwedêr ji destê civakê bigire û civakên dîtir bişibîne xwe. Di serî de jî berê xwe dide ziman. Eger zimanê tê bikaranîn ne zimanê nivîskî be li hemberî polîtîkayên asîmîlasyonîst ên hêzên dagirker û mêtingeriyê nikare zêde li ber xwe bide...*Hesen Karasûngûr*

*R-4*

# VAN 5 SERÇETEYAN FERMANA KOMKUJIYAN DIDAN



## DETAYÊN OPERASYONÊ EŞKERE BÛN

Detayên operasyona li Dêrazorê li ser sînorê Iraq û Sûriyê ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD û artêşa Iraqê bi koordîneyî meşandin û 5 serçeteyên DAÎŞ'ê yên li wan dihate gerîn hatin girtin, eşkere bûn. Hat ragihandin ku 5 çeteyên ku hatine girtin fermana gelek komkujiyan dane. Navenda Ragihandinê ya Ewlekariya Iraqê diyar kir ku li gorî agahiyên ji çeteyên DAÎŞ'ê hatin girtin, li ser sînorê Iraq-Sûriyê êrîşa hewayî hatiye kirin û 40 çeteyên DAÎŞ'ê jî hatine kuştin.

## DAIŞ'Ê DERBEKE GIRAN XWAR

Pisporê Ewlekariyê yê Iraqê Hîsham al Saîd got, "Serçeteyê bi navê Îsmaîl Alwan Salman El-Îthawî alîkarê Baxdadî bi xwe ye û ji şandina pereyan ji bo hesabê çeteyên li welatên cuda berpirsyar e." Piştî El-Îthawî hate girtin, hesabên bankayê yên rêxistina çete û hemû kodên lê dihatin bikaranîn kifş bûn. Di nava çeteyên hatin girtin de, çeteyê DAÎŞ'ê yê bi navê Saddam el-Jamal ê ji Sûriyê heye, ku weke waliyê herêma Firatê dihate binavkirin.*R-2*

## Li Efrînê hêjmara kuştiyên esker û çeteyan 2436



■ Di çarçoveya qonaxa duyemîn ya Berxwedana Serdemê de li Efrînê şervanên YPG û YPJ'ê derbên giran li esker û çeteyên tirk yên dagirker didin. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyek da û diyar kir ku di nava neh rojên dawiyê de 15 leşker û çete hatine kuştin. Bi vî awayî hejmara kuştiyên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ji destpêka êrîşên li ser Efînê heta niha bû 2436.. *R-2*

## Li Lêlkan û Çelê 21 leşker hatin kuştin

■ Li bakur û başûrê Kurdistanê gêrîlayên HPG'ê bi çalakiyên bi bangor derbên giran li artêşa Tirk a dagirker dide. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, di çalakiya 10'ê Gulanê de li Lêlîkanê 19 leşkerên Tirk hatine kuştin, 8 leşker jî birîndar bûne. HPG'ê ragihand, li Çelê jî 2 leşker hatine kuştin. *R-2*

## Li Efrînê 28 jin hatin kuştin û revandin




Kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê bê navber li ser welatiyan didomin. Di nava mehekê de 28 jin rastî destdirêjî, kuştin û revandinê hatin. Çeteyên dewleta Tirk li Efrînê mîna DAIŞ'ê desmalên seriyan û kincên reş li ser jinan ferz dikin. *R5*

## Şervanên QSD'ê gihîştin Çemê Firatê

Pêngava Bagera Cizîrê ya li rojhilatê Dêra Zorê ku ji ber êrîşa dewleta Tirk a ji bo dagirkirina Efrînê sekinîbû û 1'ê Gulanê de ji nû ve dest pê kiribû di roja 12'an de didome. Pêşdeçûna şervanan didome û şervan derbên giranli çeteyan didin. Şervanan qadeke berfireh ji çeteyên DAÎŞ'ê paqij kirin û gihîştin Çemê Firatê.*R-2*



## 24'ê Hezîranê divê bibe dawiya Erdogan



■ Hevseroka Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Pervin Buldan diyar kir ku ger HDP di bin bendê de were hiştîn wê AKP zilma xwe li Tirkiyê zêdetir bike û got, "Divê dîroka 25'ê Hezîranê bibe dîroka bê Erdogan." Bûldan li ser tifaqa kurdan jî got, "pêwîste yekîtî û tifaqa kurdan tenê bi hilbijartinê ve sînor nemîne."*R-4*

## Cara 75'an daxwaza hevdîtinê hat red kirin



■ Dewleta Tirk destûrê nade malbat û parêzerên rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku biçin Îmraliyê û pêre hevdîtinê bikin. Ji malbata Ocalan bira û xwîşka Rêber Ocalan cara 75'an jî serlêdan kirin ku biçin Îmraliyê lê dewleta Tirk ev daxwaza wan dîsa red kir.*R-5*

## Li Efrînê paqijiya etnîkî dewam dike



Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin lez dan guhertina demografîk ya herêmê. Dewleta dagirker a Tirk çeteyên xwe yên ji Xuta û gelek herêmên din ên Sûriyê aniye, li gundên Efrînê bi cih dike. Li gundê Mêrîkanê yê Efrînê, çeteyên dewleta Tirk li 11 malên Efrîniyan hatine bicihkirin.*R-2*

## Şerê me şerê man û nemanê ye

Endama Koordînasyona Partiya Azadiya Jinê ya Kurdistanê PAJK'ê Besra Firat diyar kir ku armanca tifaqa AKP-MHP'ê tunekirina Kurdan e û da zanîn ku dewleta Tirk dixwaze mêtingeriya xwe li Rojhilatanavîn belav bike. Besrayê wiha got, "AKP di nava krîzeke mezin de ye. Dewleta Tirk êrîşî çar parçeyên Kurdistanê dike. Em jî şerê man û nemanê dikin." *R-3*



# DAIŞ'ê derbeke giran xwar

***Berdevkê Koalîsyona Navneteweyî ya bi pêşengiya DYA Ryan Dillon daxuyaniyek da û diyar kir ku 5 berpirsyarên DAÎŞ'ê di encama operasyona koordîneyî ya QSD û artêşa Iraqê de bi saxî hatine girtin. Dillon got, "Girtina wan derbeke girîng e ku li DAÎŞ'ê hatiye xistin."***



QSD'ê û artêşa Iraqê, detayên operasyona ku 5 serçeteyên DAÎŞ'ê lê hatin girtin eşkere kirin. Berdevkê Koalîsyona Navneteweyî got, ev yek derbeke mezin e ku li DAÎŞ'ê hatiye xistin.

Detayên operasyona ku Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û artêşa Iraqê bi koordîneyî meşandin û 5 serçeteyên DAÎŞ'ê yên li wan dihate gerîn hatin girtin, eşkere bûn.

Li gorî daxuyaniya Navenda Ragihandinê ya Ewlekariya Iraqê, navê serçeteyên hatine girtin wiha ye: "smail Alwan Salman El-İthawi (Ebu Zeyd el Iraqi), Saddam Omer Yahya El-Jamal (Ebu Ruqeya Ensari), Muhammed Huseyin (Ebû Seyf el Şeiti), İssam Abdulqadir El-Zobaie (Ebû Abdul Haq el Iraqî), Omer Şihab Hammad Karbouli (Ebû Hafs el-Karbouli)."

Pisporê Ewlekariyê yê Iraqê Hîsham al Saîd got, "Îsmaîl Alwan Salman El-Îthawî alîkarê Baxdadî bi xwe ye û ji şandina pereyan ji bo hesabê çeteyên li welatên cuda berpirsyar e.

Navenda Ragihandinê ya Ewlekariya Iraqê diyar kir ku li gorî agahiyên ji El-Îthawî hatine girtin, li ser sînorê Sûriye-Iraqê operasyon hatiye kirin.

Piştî El-Îthawî hate girtin, hesabên bankayê yên rêxistina çete û hemû kodên lê dihatin bikaranîn kifş bûn.

**FERMANA GELEK KOMKUJIYAN DAN**

Di nava çeteyên hatin girtin de, çeteyê DAÎŞ'ê yê bi navê Saddam el-Jamal ê ji Sûriyê heye, ku weke waliyê herêma Firatê dihate binavkirin.

Hate gotin, serçeteyên DAÎŞ'ê yên hatin girtin, fermana gelek êrîş û komkujiyên li Mûsil û Enbarê dane.

**40 ÇETEYÊN DAÎŞ'Ê JÎ HATIN KUŞTIN**

Navenda Ragihandinê ya Ewlekariya Iraqê diyar kir ku li gorî agahiyên ji çeteyên DAÎŞ'ê hatin girtin, li ser sînorê Iraq-Sûriyê êrîşa hewayî hatiye kirin û 40 çeteyên DAÎŞ'ê jî hatine kuştin.

**DERBEKE GIRÎNG E**

Berdevkê Koalîsyona Navneteweyî ya bi pêşengiya DYA Ryan Dillon daxuyaniyek da û diyar kir ku 5 berpirsyarên DAÎŞ'ê di encama operasyona koordîneyî ya QSD û artêşa Iraqê de bi saxî hatine girtin. Hate ragihandin ku çeteyên DAÎŞ'ê yên hatine girtin berpirsyarên Dêra Zorê ne û 4 jê Iraqî ne, yek jî Sûriyeyî ye.

Dillon got, "Girtina wan derbeke girîng e ku li DAÎŞ'ê hatiye xistin. Ev yek nîşan dide ku di navbera artêşa Iraqê û QSD'ê de ji bo têkbirina DAÎŞ'ê koordînasyoneke berfireh heye."

## Şervanên QSD'ê gihîştin Çemê Firatê



Qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê du roja 12'emîn de ye. Şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD gihîştin Çemê Firatê.

Pêngava Bagera Cizîrê ya li rojhilatê Dêra Zorê ku ji ber êrîşa dewleta Tirk a ji bo dagirkirina Efrînê sekinîbû û 1'ê Gulana 2018'an ji nû ve dest pê kiribû di roja 11'an de didome.

Şervanên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) qadeke berfireh ji çeteyên DAÎŞ'ê paqij kirin û gihîştin Çemê Firatê. Gundê Bakozê niha ji aliyê şervanên QSD'ê ve dorpêçkirî ye.

## Li Lêlkanê 21 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiya 10'ê Gulanê ya li Lêlîkanê daxuyaniyek da.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, di çalakiya 10'ê Gulanê de li Lêlîkanê 19 leşkerên Tirk hatine kuştin, 8 leşker jî birîndar bûne. HPG'ê ragihand, li Çelê jî 2 leşker hatine kuştin.

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:

"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Agirî û Şehîd Pîroz de, 10'ê Gulanê saet 09:50'î li dijî artêşa TC a dagirker a li ser girê Lêlîkanê yê li Başûrê Kurdistanê çalakiyeke berfireh kirin. Ji 10 aliyan ve derbên giran li kozik, stargeh û konên dijmin ên li ser gir hate xistin û di encamê de 9 çeperên dijmin hatin rûxandin. Bi qasî ku hate tespîtkirin, 19 leşkerên dijmin hatin kuştin, 8 jî birîndar bûn. Artêşa TC a dagirker piştî çalakiyê bi obus, hawan û balafirên şer bombe li herêmê barand. Artêşa TC a dagirker ji danê êvarê heta ber destê sibehê bi helîkopterên bi tîpa Skorsky termên leşkerên xwe û yên birîndar ji herêmê rakir.

9'ê Gulanê saet 17:20'î, hêzên me di çarçoveya pêngava şoreşgerî de li dijî artêşa TC a dagirker a li ser girê Xeregol ê li navçeya Çelê ya Colemêrgê çalakiyek kirin. Di vê çalakiyê de ku derbên giran li dijmin hatin xistin, 2 çeper hatin rûxandin û 2 leşkerên dijmin hatin kuştin."

## Li Efrînê paqijiya etnîkî dewam dike

Dewleta Tirk a dagirker, çeteyên xwe yên ji Xuta û gelek herêmên din ên Sûriyê aniye, li gundên Efrînê bi cih dike.

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên El Nûsra, DAÎŞ û OSO, piştî ku dest bi êrîşên dagirkirina Efrînê kirin, bi sedan xanî û kargehên gelê Efrînê talan kirin û bi dehan ji wan bi dozeran xera kirin.


Dewleta Tirk, piştî komkujî û talanê, dest bi guhertina demografiya herêmê kir. Çeteyên xwe yên ji Xuta û bajarên din ên Sûriyê aniye, li malên Efrîniyan ên li gundên Efrînê bi cih dike.

Li gorî agahiyên ji herêmê hatin girtin, li gundê Mêrîkanê yê Efrînê, çeteyên dewleta Tirk li 11 malên Efrîniyan hatine bicihkirin.

Xwediyê xaniyên ku çete lê bi cih bûne: Evdo Sîdo, Eslan Hemdî, Mecîd Hemdî, Rizgar Hemdî, Rûdî Hemdî, Cemîl Hemdî, Behcet Hemdî, Bedreddîn Sîno, Evdılhedî Hemdî, Farûq Aslan, Hîsnî Hemdî.



## Lîstikên dagirkeriyê li ser bakurê Sûriyê dewam dikin



Dagirkeriya Tirkiyê li gundewarê Idilbê 9 dever bi navê "nûqteyên çavdêriyê" ragihand. Dagirkeriya Tirkiyê bi vê yekê hewl dide van deveran wekî bajarê Tirk îlan bike û niştecihên wê beşdarî hilbijartinan bike.

Desthilatdariya Tirkiyê beriya demekê ragihandibû ku hejmara nûqteyên çavdêriyê li bakurê Sûriyê, ji bakurê Idlibê, gundewarê rojava û başûrê Helebê wê bighêje 12 nûqteyan.

Bi avakirina nûqteyan re şandeyeke leşkerî ya girêdayî dagirkeriya Tirkiyê ji bo çavdêriyê derbasî gundewarê Cisir El-Şixûr ê rojavayê Idlib û gundewarên bakurê Laziqiyê bûn.

Di vê çarçoveyê de, kerwanek hêzên dagirkeriya Tirkiyê derbasî herêmên li ser sînor ên bakurê Idlibê bû û berî xwe dan herêma El-Raşidîn a dikeve rojavayê Helebê. Hêzên dagirker 9 nûqteyên çavdêriyê li bakurê Sûriyê ava kirin.

Her wiha şandeyek ji bo çavdêriyê yên girêdayî dagirkeriya Tirkiyê ji herêma li ser sînor ên gundewarê Cisir El-Şixûr derbasî Sehil El-Xab ê gundewarê Hema, bakurê Laziqiyê bûn, da ku hewl bide korîdorekê li deriya Spî ava bike.

Çavêdran diyar kirin ku dagirkeriya Tirkiyê bi riya çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam hewl dide fermanên xwe li ser şêniyên bakurê Sûriyê yên ku qebûl nekin beşdarî hilbijartina bibe, feriz bike…*ANHA*

## Li Efrînê hêjmara kuştiyên esker û çeteyan 2436



Çalakiyên şervanên YPG/YPJ'ê yên li Efrînê di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê de tên kirin, didomin. YPG'ê diyar kir ku di nava 9 rojan de 15 leşker û çeteyên Tirk hatine kuştin.

Navenda Ragihandinê ya YPG'ê li ser çalakiyên şervanên YPG/YPJ'ê yên rojên dawî li Efrînê hatine kirin daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku ji 29'ê Nîsanê heta 8'ê Gulanê gelek çalakî li dijî dagirkeran hatine kirin û di encamê de 15 leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker hatine kuştin, 5 çete û leşker jî birîndar bûne.

**HEJMARA KUŞTIYÊN ARTÊŞA TIRK Û ÇETEYÊN BÛ 2436**

Di encama çalakiyan de li herêma Efrînê di nava 9 rojan de 15 leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker hatin kuştin, bi qasî ku hat zelalkirin 5 çete û leşker jî birîndar bûn. Bi vî awayî hejmara kuştiyên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ji destpêka êrîşên dewleta dagirker heya niha bû 2436."



# Mizgîn navê hunera şoreşgerî ye

***Bi boneya salvegera şehadeta hunermenda şoreşger Hozan Mizgîn endamên çand û hunerê yên li rojavayê Kurdistanê diyar kirin ku wê hozan Mizgîn ji bo wan her tim bibe mînaka têkoşînê. Endamên TEV-ÇAND'ê wiha gotin, "Hozan Mizgîn nasnameya şoreşgerî ya hunera kurd e. "***

**Ferîşte NEZÎR/ Rizgar HEBEŞ**

Bi boneya 26'emîn salvegera şehadeta tekoşer û hunermenda şoreşger ya kurd Hozan Mizgîn bi navê rast Gurbet Aydin)ku di 11ê Gûlana 1992'an de di encama şerkê dijî dagirkeriyê de şehîd bû endamên çand û hunerê ser rola hunermendan di şoreşê de nerînê xwe anîn ziman û diyar kirin ku di kesayeta hozan Mizgîn de hemû şehîdên TEV-ÇAND'ê bi bîrtînin, Ş.Mizgîn Bi taybetmendiya rêxistin bûn û pratîkbûn bandor li gelê kurd kir û hişt ku ew beşdarî nava refên tekoşînê bibin û bûn pêşengê hunera resen."

**NASNAMEYA HUNER-**

**MENDA ŞOREŞGER BÛ**

Endama Koma sazkar Şêrîn Mihemed diyar kir Ş.Mizgîn bi dengê xwe yê xweş û bi temenê xwe biçûk bandor li gel û taybet li jinan kir û wiha got: "Gelek ciwanên kurd, ji Ş.Mizgîn bandorbûn û tevlî refên tekoşînê bûn. Ji bo wê jî bi tekoşîna xwe dibe ziman û mînaka tekoşîna me."

Şêrîn wiha bi dawî kir:"Hunermend Mizgîn nasnameya şoreşgeriya tekoşîna kurd pênase dike. Di qada siyasî, civakî û çandî de raperîna li hember mêjiyê desthilat kirirn, em weke jinek kurd pîvanên serweriya paşverû dişkîne."


**HUNERMEND Û PÊŞENGEK MEZIN BÛ**

Endama Koma Botan Nesrîn Botan jî wiha got: "Dema em hestên xwe bi deng û muzîka Ş.Mizgîn bidine xwedîkirin wê demê emê karibin tekoşînek rast û jiyaneke rast derxin holê. Eger em vê bikin emê karibin wate, hest û mezinbûna hunera şoreşgerî ya kurd derxin zanebûnê."

Nisrîn di dawî de di şexsê Ş.Mizgîn de hemû şehîdên TEV-ÇAND'ê bibîr tînin û em weke rêxistina TEV-ÇAND'ê soza xwedî derketina li bîranîna wan didin."

**BI KESAYET Û HUNERA XWE HIŞMENDÎ GUHERT**

Şanoger Gulanz Derwîş ji Serê Kaniyê wiha nerînê xwe got: "Mizgîn mîrate û mînaka hemû jinên hunermende, li ser vê bingehê jinên çand û hunerê xwe pêşdixin ji ber ne herkes dikare bibe hunermend. Ji bo wê pêwîste em bi mîrateya dîrok, çand û filkilora resen ji hişmendiya desthildaran biparêzin. Ji ber hunermend Mizgîn bi huner û kesayeta tekoşer, jinên ku hîn di bin enqazê hişmendiya zilamê serdest dene şikand."









Gulanz wiha bi dawî kir: "Em jinên çandê azadiya xwe di huner û şehadeta rêheval Mizgîn de dibînin."

Endamê Koma Botan Danîş Botan diyar kir ku hunermend cihê xwe di hûndirê civakê de digrin, ji ber ew nûnerê wijdan û exlaqê civakê ne û wiha got: "Ş.Mizgîn xwedî taybetmendiyek wiha ye ku bi dengê xwe dengê hemû gelên bindest bilind kir û gihand cîhanê. Rêvebirin û rêxistinkirina gel û şoreşan erkekî sereke yê hunermendan ne, mînak şehîd Mizgîn, Serhed, Mihemed Şêxo, Eyşeşan ev hunermend di hişyarkirin û avakirina civakê de xwedî roleke mezinin."

Danîş Botan bi bang dawî kir: "Banga me ji hemû hunermendan re ku li şoreşa û hunera xwe ya gelerî û resn xwedî derkevin, ji ber ku hebûna me girêdayî çand û hunera me ye".

## Mizgîn bû qêrîna azadiyê



Komîteya Kevana Zêrîn, fermandara gerîla û hunermend Hozan Mizgîn bi bîr anî û got, "Kesayetiya pir alî, hevgirtî û hunermend a hevrê Mizgîn, nîşaneya destanbûyîna jinên Kurd e."

Komîteya Jinên Kevana Zêrîn a TEV-ÇAND'ê, bi wesîleya salvegera 26. a şehadeta Gûrbet Aydin (Hozan Mizgîn) daxuyaniyeke nivîskî da.

Komîteya Kevana Zêrîn di şexsê Hozan Mizgîn de "Şehîdên Meha Gulanê" bi bîr anî û got, "Em bejna xwe bi rêzdarî li ber bîranîna wan ditewînin."

**JIYANEK NÛ LI KURDISTAN AVAKIRIN**

Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku di meha Gulanê de şehadetên mezin rû dane û hate gotin, "Di serî de şehadeta hevrê Hozan Mizgîn, Hakî Karer, Xelîl Çavgûn, Mehmet Karasûngûr û Îbrahîm Bîlgîn, şehadetên di meha Gulanê de rû dan, hîmên jiyaneke nû li Kurdistanê danîn. Wekî din, di 9'ê Gulana 2010'an de li Zindana Evînê ya Tehranê hevrê Şîrîn Elemholî (Ronahî Makû), Ferzad Kemanger, Ferhad Wekîlî, Elî Heyderiyan û Mehdî Îslamiyan bi dar ve kirin.

Şêweyê şehadeta van hevrêyan, nîşaneya tirsa ji têkoşîna azadiyê ye. Ji bo têkoşîna azadiyê ya Kurd jî berxwedaneke bêhempa û nîşaneya berxwedana çanda Hallaci Mansûr e."

**YEKEMÎN FERMANDARA JIN A EYALETÊ BÛ**

Di dewama daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku 11'ê Gulana 1992'an, Hozan Mizgîn ji bo bi saxî nekeve destê dijmin bi rengekî fedayî şehîd bû û wiha hate gotin, "Têkoşîn û kesayetiya wê ya pir alî ku vê hevrêyê ji me re weke mîrate hişt, coş û daxwazeke bê dawî ya têkoşînê dide me. Hevrê Ş. Mizgîn ku di dîroka têkoşîna me ya jinê de xwedî cihekî girîng e, yek ji damezrînerên tevgera destpêkê ya jinê YJWK bû. Her wiha li Garzanê jî yekemîn fermandara jin a eyaletê bû. Mizgîn tê wateya nivîsandina navê xwe li destanên destpêkê yên jinên azad ên Kurdistanê. Kesayetiya pir alî, hevgirtî û hunermend a hevrê Mizgîn, nîşaneya destanbûyîna jinên Kurd e."

**LEHENGEKE HUNERÊ BÛ**

Komîteya Kevana Zêrîn di daxuyaniya xwe de got, "Şehîd Mizgîn hem jinên Kurd bi rêxistin kir, hem jî bû fermandara artêşa gelekî û li refên herî pêş cih girt."

Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin, "Ev hevrêya me ku bi dengê xwe bû qîrîna azadiyê ya hemû jinan û Kurdistanê, yek ji sembolên têkoşîna me ya azadiyê ye. Ew ne tenê lehengeke li Kurdistanê ye, ew lehengeke hunerê ye ku bûye dengê hemû jinan û şoreşgereke çandê ye. Di şexsê Ş. Hozan Mizgîn de em hemû şehîdên şoreşê yên Kurdistanê bi bîr tînin, careke din soz didin wan ku em ê li Kurdistana azad her tim xwedî li bîranînên wan derkevin."

## Divê li hunermend Can xwedî bê derketin





Hunermendên Efrînê yên li Kantona Şehbayê bi cih bune, revandina hunermend Aslan Can ji aliyê artêşa Tirk a dagirker ve şermezar kirin.

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê beriya çend rojan hunermendê Kurd Aslan Can dema vegeriya mala xwe ya li navçeya Şiyê revandin. Derbarê vê yekê de hunermendên Efrînê yên li Kantona Şehbayê revandina Aslan Can şermezar kirin.

Hunermend Ehmed Elî revandina Aslan Can weke kiryareke der mirovahî bi nav kir û wiha got, ″Mafê artêşa Tirk nîne ku hunermend Aslan Can û tu kesekî din bigire. Daxwaza me ew e ku hemû gelê Efrînê yê ji aliyê artêşa dagirker ve hatîn revandin, serbest bêne berdan. Divê hemû hûnermend û gelê kurd di vê derbarê de şiyar tevbigere.″

Hunermend Ehmed Xanî jî da zanîn ku Aslan bi axa welatê xwe ve girêdayî bû û lewra jî artêşa Tirk a dagirkr ew revandin û wiha got, ″Hundermend Aslan Can bi dengê xwe yê zelal ji welatê xwe re stran digot. Lê dewleta tirk bi awayekî hovane ew revand. Dewleta tirk her roj sucên mirovahî li beramber gelê Efrînê pêk tîne. Revandina hûnermend Can jî yek ji van kiryarên dewleta tirk yên dij mirovahî ne.″

Hunermend Niyazî Seydo jî diyar kir ku artêşa Tirk hemû pîvan û exlaqê mirovî bin pê dike, malên gel talan dikin, gel dikujin û direvînin. Seydo wiha axivî, ″Heta niha tu agahî li ser hunermend Aslan Can nîne. Banga me ji civaka navneteweyî re heye ku zextê li ser dewleta Tirk bike ku hemû welatiyên Efrînê yên hatîn revandin, azad bibin.″…*ANHA*

## *Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Dibistanan destpê kir*



Çalakiyên Yekemîn a Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Dibistanên Qamişlo dest pê kirin.

Bi dirûşmeya "Ziman beden e, çand bende ne, erdnîgarî beden e, xwedî li bedena xwe derkeve" çalakiya Yekemîn Mihrîcana Çand û Hunera Dibistanên Qamişlo li stada 12'ê Adarê dest pê kir.

Mîhrîcan ji aliyê ji Rêveberiya Dibistanên Qamişlo bi hevkariya Yekîtiya Werzîşê ya herêma Cizîrê ve hatiye organîzekirin. Xwendekarên seretayî û navîn beşdarî çalakiyê bûn.

Di roja yekem a çalakiyê de 6 tîmên sporê yên bajar û navçeyên Dêrik, Amûdê, Tirbespiyê, Çil Axa, Girkê Legê û Qamişlo beşdar bibibûn û bi lîstokên voleybol û satrancê dest pê kir.

Mîhrîcan dê 4 rojan berdewam bike. Du rojên destpêkê taybet ji bo sporê ne wekî (satranc, voleybol, bazdan û fûtbol ya jinan) û du rojên dawî wê çalakiyên çandî û hunerî li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê bêne lidarxistin.

Di roja dawî ya mîhrîcanê de wê xelat werin dayîn…*ANHA*

## Fener



### Mirûdbûyîn bê îradebûyîn e

Idrîs HENAN

Di serdemên dagirkerî û mêtingeriyan de gelek têgîn û têgehên ku civakê li gorî daxwaz û xwestekên serdestan birêxistin dikin derdikevin. Ji bo rûnişkandin û iqnaya civaka bi kolebûnê hatiye xemilandin, amûr û alavên pêwîst jî têne xuliqandin. Amûrê herî guncaw û bi bandor mirovê kole bi xwe ye. Mebest ew kesê heya dawiyê li hemberî hemû cureyên tedeyan bê helwest û bertek e. Ango heya dawiyê koletiya xwe bi awayekî dogma diparêze. Ew kesên han bi wan pênaseyên bindarî sermest dibin û li gorî zihniyet û armancên dagirkeriyê têne tîmarkirin. Ji ber vê yekê jî vediguherin parêzvanên herî radîkal ji van têgîn û têgehên ku koletiyê meşrû dikin re. Civaka li ser binyada memûrtiyê têye terbiyekirin, nikare derveyî îrade û heyama koledarên xwe bijî. Nola civîka ku fêrî qefesê be, tu çiqas deriyên zîndanê jê re vekî jî nareve. Her di rewşa heyî de bi israr e.

Piştî ku gelê Efrînê ji ber êrîşên bi armanca qirkirin û dagirkeriyê mecbûrî hatina herêma Şehbayê bû, rûbirûyî terzekî nû ya jiyanê ma. Gelê Efrînê bi hatina xwe vê herêmê, şêwazê xwe yê berxwedanê li gorî şert û mercên nû jî guhart. Li hemberî dagirkerî û êrîşên asîmîleker ên dijminekî hov bû xwedî sekneke bê mînak. Gelê Efrînê bi vê sekin û helwesta xwe ya ku xwe dispêre kevneşopiya Amed, Sûr, Nisêbîn, Dimdim, Kobanê û gelek stasyonên serhildêr di dîroka têkoşîna gelê Kurd de, dikarîbû terazûya hêzê û mewziyên hezên mudexeleker li Rojhilata Navîn û Sûriyeyê biguhere. Êdî hesabên beriya Efrînê û Piştî Berxwedana Serdemê ne wek hev in. Bi berxwedana Efrînê re bi awayekî fermî şerê wekaletê li Sûriyê bi dawî bû. Her hêza cihê xwe li ser nexşeya Sûriyê girtiye cihê ku dagir kiriye, civakê li gorî mayîndebûna mêtingeriya xwe dozen dike. Ji bo vê jî mirûd û dûvikên ji civakê bi xwe ji xwe re diafirînin. Peywira wan jî ew e ku civakê teşwîqî celadan bike û koletiyê pê bide xweşikirin. Ger em niha li vê pêvajoya piştî dagirkirina Efrînê binêrin, em van tiştên me li jor gotine gelekî bi zelalî bibînin. Gelek mirov û malbat di bin navê neçariyê de têne çewisandin. Dagirkeriyê bi navê "rêveberiyê" ji mirovên ajan û kurtêlxwar ekîpekên aborî, siyasî, civakî û çandî avakiriye. Bi riya wan borîjeniya herî kirêt a kolekirina civakê dike. Ji bo wan jî bide xebitandin, hemû derfetên xwe yên medyayî û odeyên şerê taybet dixe dewrê. Ji ber vê yekê em dibînin ku gelek malbat û însanên me li ser esasê telîfonekê yan jî agahiyeke derewîn biryara kolebûyînê didin. Piştî çûyînê jî, nola ew miriyê seriyê wî li kevir bikeve û pê bihese ku yê mirî ew e, lê tê. Lê êdî dem derbas bûye! Mecbûre li gorî terbiyaya koledaran mirûdiyê bike û heya dawiyê bi dilsozî cegersozê neyarê xwe be. Mirûdbûyîn jî peyatiya çavkor a bê fikirandin e. Mirûdbûyîn dûrketina ji rexne û rexnedayînê ye. Mirûdbûyîn êrêkirin û hemtakirina başî û xirabiyan e. Ango mirûdbûyîn însanê bê sekin û bê helwest e. Ji ber van pênaseyan civaka me bi awayekî zanistî li ser hîmên ideolojiya jiyana nûjen a ku felsefeya Rêber APO afirandiye vê şêwazê mirûdbûyênê li her qadê red dike. Berovajî, ji mirûdbûyînê bêtir, xwedî sekna şerşger û hêza guherîn û veguherînê ya rizgariyê ye. Derveyî vê rêgaza Rêber APO ti şansekî civaka Kurd a jiyînê ji koletiyê pirtir nîne.

# Ala mezin a YPG'ê hate vekirin

***Li eyaleta Munchenê ya Almanyayê 30 hezar kes li dijî qanûna "dewleta polîs" ku tê xwestin li eyaleta Bayernê bê derxistin, meşiyan. Di meşê aleke mezin ya YPG'ê jî hat hildan. Xwepêşandan bi banga zêdeyî 70 rêxistinên civakî yên sivîl, sendîka û partiyên SPD, Kesk û Partiya Çep hate kirin.***



Qanûna 'dewleta polîs' ku tê xwestin li Eyaleta Bayernê bê derxistin, li Munchenê bi xwepêşandaneke girseyî hate şermezarkirin. Di xwepêşandanê de ku zêdeyî 30 hezar kes tevlî bûn, aleke mezin a YPG'ê hate vekirin.

Li Eyaleta Bayern a Elmanyayê, ku partiya mûxafazakar Yekîtiya Xiristiyanên Civakî (CSU) lê desthlatdar e, qanûneke nû tê derxistin ku rê li ber 'dewleta polîs' vedike.

Pêşnûme qanûna bi navê "Qanûna nû ya wezîfeya polîsan" (PAG -Polizeiaufgabengesetz) wê hefteya bê li meclîsa parlamentê pêşkêşî dengdanê were kirin ku CSU li parlamentê serdest e.

Pêşnûme qanûn bi serkêşiya Serokwezîrê berê yê Bayernê Horst Seehofer ve hate amadekirin, ku Seehofer di hikumeta nû ya Merkel de Wezîrê Karên Hundir e.

Pêşnûme qanûn duh li paytexta Eyaleta Bayernê li Munchenê bi xwepêşandaneke girseyî hate şermezarkirin. Zêdeyî 30 hezar kes li meydana Marienplatzê li hev civiyan û heta meydana Odeonsplatzê meşiyan ku avahiya serokwezaretiya eyaletê lê ye.

Xwepêşandan bi banga zêdeyî 70 rêxistinên civakî yên sivîl, sendîka û partiyên SPD, Kesk û Partiya Çep hate kirin. Ji hemû bajarên Bayernê mirovan berê xwe dan Munchenê. Di meşa protestoyî de komek ji xwepêşandêran aleke mezin a YPG'ê vekir. Bayern yek ji wan eyaletan e ku di serî de qedexekirina ala YPG'ê hemû qanûnên li ser qedexekirina sembolên Kurdan bi rengekî tund bi cih tîne. Xwepêşandêrên ku ala YPG'ê hildan, helwesta rêveberiya eyaletê ya li dijî Kurdan şermezar kirin.

## Ciwanan Tirkiye boykot kir




Rêxistina Ciwanên Azad, bi mebesta boykotkirina Tirkiyê li paytexta Swêd Stockholmê çalakiyeke konvedanê pêk anîn.

Li qada Stockholm Medborgarplatsenê ciwanan kon vedan û bi alên PKK û KCK'ê , wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan û wêneyên sivîlan ên ji hêla dewleta Tirk ve hatî qetilkirin, xemilandin. Ciwanên Kurd, gel di derberê sûcên şer ên dewleta Tirk kirî de bi nivîskî û devkî agahdar kirin.

Endama Ciwanên Azad Rojda Avas, di derbarê çalakiyê de axivî û diyar kir ku dema Dewleta Tirk bi çeteyên DAÎŞ'ê re Efrîn dagir kirin, bi sedan sîvîl qetil kirin û zêdetirî 150 hezar kes ji ser axa xwe hatin derxistin.

Avas, di dewama axaftina xwe de bal kişand ser ku Dewleta Tirk li Bakurê Kurdistanê jî komkujî pêk anîne û hilbijêrên gel xistine zindanan. Avas got; "Ji bo protestokirina sûcên mirovahiyê yên dewleta Tirk, divê Tirkiye bê boykotkirin. Em di çalakiya xwe de bang li Swêdî û kesên li Swêdê dijîn dikin ku neçin Tirkiyê û malên Tirkiyê boykot bikin."

## Alîna YPJ'yî li welatê xwe hate bibîranîn



Şervana YPJ'ê Alîna Sanchez (Lêgerîn Çiya) ya ku di 17'ê Adarê de li Hesekê di qezaya trafîkê de şehîd bûbû li bajarê Bûenos Aîres ê Arjantînê hate bibîranîn. Bibîranîn li Navenda Karkeran a Arjantînê li ATE'yê hat lidarxistin. Malbata Sanchez, gelek tevgerên jinan, rêxistinên saziyên civakî, partiyên siyasî, dayîkên Plaza Mayo, parlementer û hevalên têkoşînê yên Sanchez tevlî bibîranînê bûn.

Di bibîranînê de belgefîlma li ser Sanchez hate temaşekirin. Di merasîma bîranînê de nûnerên tevgerên jinên kurd, hevalên Alîna, Dayîkên Plaza de Mayo, Nora Cortînas li ser taybetmendiyên têkoşer Lêgarîn axifîn.

Di bibîranînê de dê û bavê Alîna axifîn gotin , "Alîna di dilê Kurdan de cihekî xwe yê girîng heye, wê di nava gelê Kurd de cihê xwe dît. Li Rojava ji bo bijîşkiyê zanîngehek ava kir. Gelê Kurd baweriya xwe bi wê anî."

Piştî axaftinan ji aliyê rojnamegera femînîst Lîlîan Daûnes helbestên gerîlayên Kurd û helbesteke şehîd Alîna Sanchez hate xwendin û muzîkên li ser çanda Kurd hatin guhdarîkirin.

## Puigdemont ji bo serokatiyê nabe namzet

Rêveberê serxwebûnxwaz ê herêma Katalonyayê Carles Puigdemont, ji ber ku li sirgûnê ye li Elmanyayê daxuyanî da û diyar kir, ew ê ji nû ve nebe serokê herêmê.

Carles Puigdemont ji bo serokatiyê Quim Torra pêşniyar kir. Rêveberê Katalan Puigdemont got, "Koma me parlamenter Quim Torra ji bo serokatiya Generalitat pêşniyar dike." "Generalitat de Catalunya" ji Parlamenta Katalonyayê ya ji 135 kesî û Hikumeta Katalonyayê pêk tê. Puigdemont destnîşan kir ku weşanger Torra (55) dibe ku di rojên bê de bibe serok.

Hikumeta Spanyayê ya mûxafazakar, ji bo Serokê berê Puigdemont careke din nebe serok ketibû nava hewldanan. Rêveberiya navendî li ser Katalonyayê ferz kir ku ji bo avkairina hikumetê namzetekî nû diyar bike.

Puigdemont li ser van zextan got, "Bêhurmetiya dewletê ya li hemberî îradeya welatiyên Katalonyayê li pêş çavên tevahiya cîhanê eşkere bû." Serokê berê bang li rêveberiya nû ya herêmî kir



ku welatekî serbixwe ava bike.

Tevî Madrîdê zexteke giran jî kir, di hilbijartina herêmî ya meha Kanûnê de serxwebûnxwaz ji nû ve bi ser ketibûn. Eger heta 22'ê Gulanê serokê nû neyê hilbijartin, Katalan wê bi rengekî otomatîk neçar bimînin ji nû ve biçin ser sindoqan û deng bidin.

## Trump-Kim Jong Un, li Singapûrê dicivin

Roj û dîroka hevdîtina di navbera Serokê DYA'yê Donald Trump û lîderê Koreya Bakur Kim Jong Un de diyar bû.

Serokê DYA'yê Trump, di daxuyaniya xwe ya bi rêya twitterê belav kirî de ragihand ku hevdîtina çav li rê bû bihata kirin, wê di 12'ê Hezîranê de li Sîngapûrê pêk bê. Trump got; "Em ê her du jî bibin xwedî hewldanan ku ev hevdîtin bibe sedema pêşketinên girîng".

Ev daxuyanî, piştî ku sê Amerîkî ji hêla rêveberiya Pyongyang ve



hatibûn serbest berdan, hat kirin. Trump hê beriya niha çend mehan heqaret li Kim Jong Un kiribûn û gef lê xwaribûn, vê carê spasiyên xwe li rêveberê Koreya Bakur kirin û da zanîn ku ji hevdîtinê bi hêvî ye.

Trump, Amerîkiyên hatî serbestberdan pêşwazî kirin û teqez kir ku wê hevdîtina bi Kim Jong Un re encamên serkeftî bi xwe re bîne.

Wezîrê karê derve ya DYA'yê Mike Pompeo jî got, "dibe ku hevdîtin ji rojekî zêdetir bidome.

Li gorî ajansa fermî ya Koreya Bakur KCNA'yê, Kim Jong Un, vê hevdîtina ku bê kirin weke "fersendeke dîrokî" dinirxîne û gotiye wê ev hevdîtin xizmeta "pêşerojeke baştir" bike.

## Îran naxwaze aloziyeke nû rû bide



Serokkomarê Îranê Ruhanî ku li Sûriyê bi Îsraîlê re şer dike, îdîa kir ku ew 'naxwazin aloziyên nû rû bide' û 'ji bo ewlekarî û aramiyê' dixebitin.

Aloziya navbera Îran û Îsraîlê, piştî bomberdûmana bi fuze û balafirên şer ên li Girên Golanê kete rojeva cîhanê.

Aloziya piştî vî şerî rû da, dewam dike. Serokkomarê Îranê Hasan Ruhanî ragihand ku welatê wî naxwaze hê bêhtir alozî rû bide.

Ruhanî piştî ku bi Serokwezîra Elmanyayê Angela Merkel re bi rêya telefonê axivî daxuyanî da û diyar kir ku ew naxwazin li herêmê aloziyên nû rû bidin.

Di daxuyaniya Serokkomariyê de hate gotin ku Îran ji bo kêmkirina tansiyona li herêmê dixebite.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku ji Merkel re jî hatiye ragihandin ku Îran dixwaze ewlekarî û aramiya li herêmê xurt bike.



# Şerê me şerê man û nemanê ye

***Endama Koordînasyona Partiya Azadiya Jinê ya Kurdistanê PAJK'ê Besra Firat diyar kir ku armanca tifaqa AKP-MHP'ê tunekirina Kurdan e û da zanîn ku dewleta Tirk dixwaze mêtingeriya xwe li Rojhilatanavîn belav bike. Besrayê wiha got, "AKP di nava krîzeke mezin de ye. Dewleta Tirk êrişî çar parçeyên Kurdistanê dike. Em jî şerê man û nemanê dikin."***



Endama Koordînasyona PAJK'ê Besra Firat dagirkeriya dewleta Tirk a li Efrînê û Başûrê Kurdistanê nirxand û destnîşan kir ku li dijî faşîzma AKP-MHP'ê şerekî mezin ê man û nemanê tê kirin.

Endama Koordînasyona Partiya Azadiya Jinê ya Kurdistanê (PAJK) Besra Firat, hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê, êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê ji ANF'ê re nirxand.

Besra Firat işaret bi tifaqa Erdogan-Bahçelî ya ji bo tinekirina Kurdan kir û got, "Armanca van Osmaniyeke nû ye. Dixwazin mêtingeriya xwe ya li Rojhilata Navîn mezin bikin. Têkoşîna me ya 40 salan a li dijî vê yekê nîşan dide ku sîstema faşîst êdî têk çûye û ji ber vê yekê êrîşî çar herêmên Kurdistanê dikin. Êrîşa li ser Efrînê li holê ye. Êrîşên li ser Başûrê Kurdistanê jî bi heman armancê dikin. Lê belê vê yekê sîstema wan tengav kiriye. AKP niha di nava krîzeke mezin de ye. Ji aliyê siyasî, aborî, civakî û dîplomasiyê ve di nava kaosê de ye. Ji bo emrê xwe dirêj bike, bi bayê bezê biryara hilbijartina pêşwext dan. Xwestin di nava Rewşa Awarte de hilbijartinê bikin."

Besra Firat işaret bi girîngiya hilbijartinê ji bo jinan jî kir û got, "Ji ber ku êrîşa faşîzmê bi giranî li dijî jinan tê kirin. Bêguman di şexsê jinan de timî êrîşî civakê dike. Lewma sekna jinan di vê hilbijartinê de gelekî girîng e. Jinan tifaqa xwe kirin, ev yek gelekî erênî ye."

### ÊRÎŞÊN DAGIRKERIYÊ YÊN LI EFRÎN Û BRADOSTÊ


Firat işaret bi êrîşên artêşa Tirk ên ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê jî kir û got, "Ev êrîş ne tenê li dijî gerîla û tevgera azadiyê ya Kurd e. Ev êrîş li dijî tevahiya gelê Kurd e. Bi taybetî li hemberî gelê Başûrê Kurdistanê ye. Ji bo êrîşên xwe yên li ser herêma Bradostê, 'parastina xwe' weke bahane nîşan didin. Halbûkî heta niha ji herêma Bradostê êrîş li ti dewletê nebûye. Ev êrîş polîtîkayeke ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê ye ku bi zanebûn tê kirin. Û ji bo pêşîgirtina li têkoşîna azadiyê ya Kurd e. Bi taybetî êrîşek li dijî gelê me yê li herêma Bradostê ye."

### ŞERÊ MAN Û NEMANÊ YE

Firat bi bîr xist ku gelê Bradostê welatparêz e, di dîroka Kurdistanê de xwedî rolekê ye û got, "Gelekî ku dilsozê axa xwe ye. Dixwazin wan ji cih û warê wan derxînin. Lewma êrîşên faşîzan dikin. Divê gelê Bradostê, tevahiya gelê Başûrê Kurdistanê hişyar be û li ber xwe bide. Gelê Başûr li ber vê dagirkeriyê radibe. Malên Tirkan boykot dikin. Di dema dagirkirina Efrînê de timî li ser piyan bû. Lê belê ev têrê nake, lewma divê çalakiyên xwe bidomînin. Yên ku li çar parçeyên Kurdistanê bi armanca dagirkeriyê radibe û dijminatiyê li Kurdan dike, dewleta Tirk e. Yê ku dewletên din sonr dike jî dewleta Tirk e.

Şerê ku em dikin şerê man û nemanê ye. Dijmin jî li dijî me şerê tinekirinê dike. Şerê ku 40 sal in em li dijî vê sîstema faşîst dikin gihîştiye astekê, rewa bûye û gelên cîhanê xwedî li vê têkoşînê derdikevin. Kes nikare gelê Kurd ji nedîtî ve bê, lewma divê berxwedan û têkoşîn bê geşkirin. Divê yekîtiya neteweyî û yetîkiya jinan bê afirandin."

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Netewa Demokratîk -2-

Abdulah Ocalan

Ji bo vê danasîna giştî ya netewe bêhtir sofîstîk bikin têgînên weke neteweya dewletê, neteweya huqûqê, neteweya ekonomiyê û neteweya eskerî (artêş-millet) çêdikin û ev neteweperestok kategoriyên cuda ne, neteweya giştî bi hêz dikin. Mirov dikare ji van re neteweya hêz û zorê jî bibêje. Yek ji armancên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst pêkanîna neteweya bi hêz e. Ji ber ku neteweya bi hêz di warê sermayeyê de dibe xwedî îmtiyaz, dibe xwedî bazara berfireh, derfetên mêtingerî û emperyalîzmê. Lewma gelekî girîng e, divê mirov van neteweyên bi hêzkirî weke modela bi tenê ya netewe nebîne, heta divê mirov wan weke neteweyên şoven ên bi hêz û neteweyên di xizmeta sermayeyê de bibîne. Jixwe ji ber van xisletên xwe çavkaniya pirsgirêkan in. Modela netewe ya ji çandê netewe çêke, lê zordestî û mêtinkariyê bi gem bike û nexwaze, modela netewe ya demokratîk e. Neteweya demokratîk, neteweya herî zêde nêzî wekhevî û azadiyê ye. Li gorî vê danasînê, ji bo civakên lêgerîna wan a azadî û wekheviyê heye, ev têgihiştina netewe ya herî di cih de ye.

Modernîteya kapîtalîst û sosyolojiya ji wê îlhamê digire, li ser kategoriya neteweya demokratîk nasekinin. Ev jî ji şêweyê avabûn û hegemonya wê ya îdeolojîk e. Neteweya demokratîk bi tenê qîma xwe bi hevpariya zêhniyet û çandê nayne, bi tevahî endamên xwe li saziyên xweser ên demokratîk digihîne hev û rêve dibe. Ev xisleta wê ya diyarker e. Şêwazê rêveberiya demokratîk û xweser ji bo netewebûna demokratîk şertê pêşî ye. Bi vî aliyê xwe alternatîfa dewleta netewe ye. Li şûna rêveberiya dewletê, rêveberiya demokratîk derfetekî mezin ê azadî û wekheviyê ye. Sosyolojiya lîberal, neteweyê yan bi dewleteke avabûyî re yan jî bi tevgerekê re ku armanca wê avakirina dewletê ye, wekhev dibîne. Sosyalîzma pêkhatî jî xwedî lêgerîneke bi vî rengî bû û ev jî hêza îdeolojiya lîberal nîşan dide. Modernîteya alternatîf a neteweya demokratîk modernîteya demokratîk e. Ekonomiya ji yekdestdariyê rizgarbûyî, ekolojiya bi hawîrdorê re lihevkirî, teknolojiya dostê xweza û mirovî, bingehê sazîbûna modernîteya demokratîk e, ango bingehê sazîbûna neteweya demokratîk e.

Ji bo civakên neteweyî weke şertên pêşî diyardeya welatek û bazareke hevpar destnîşan dikin, lê ev weke hêmanên maddî nabe ku weke xisletên diyarker ên netewe bêne hesibandin. Di vî warî de mînak Cihû ne; demeke dirêj timî bêwelat man, lê di dîrokê de timî weke neteweyeke bi hêz li guher û goşeyên dewlemend ên dinyayê jiyan, tevî ku bazareke wan a neteweyî tinebû ji wan hat ku li bazarên dinyayê bibin neteweya tekane ya herî bi hêz. Bêguman welat û bazar ji wan navgînan in ku dewlet-neteweyê bi hêz dikin. Ji bo welat û bazarê şerên herî zêde û xwînrij ên dîrokê hatine kirin. Welat weke milk, bazar jî weke qada karê gelekî bi nirx in. Têgihiştina neteweya demokratîk a welat û bazarê cihê ye. Neteweya demokratîk welat bi nirx û hêja qebûl dike, ji ber ku ji bo çand û zêhniyeta netewe derfeteke mezin e; çand û zêhniyeteke di bîra wê de nebe nîne.

## Hemleye çalakkirina Komînan berdewam dike

Melek DEMÎRTAŞ

Bi armanca çalakkirina kooperatîfan di komînên xweser û pêşxistina hişmendiya kopertîfan di civakê de, Komîteya Aboriya Jin A Kantona Qamişlo bi alîkariya Kongra Star di 5'ê Çile de dest bi hemleya rêze civîn ji komînên xweser re kiribûn û ev 4 mehin berdewamdike.

### JİN AFRÎNERİYA ABORİYÊ YE

Berdevka Aboriya Jin ser asta Bakurê Sûriyê Horî Şemdîn ser rewşa dawî a hemleyê, ev agahî dan: "Ev 4 mehin ku bi çoş û pêşniyarên cur be cur hemleya çalakirina komînan berdewam dike. Kooparatîf sîstemek civakî ye, ji bo wê civak bi xwe pêşniyar dike û berhema keda xwe digre, kooparatîf di milê hişmendî de guhertin avadike. Kooperatîf mîna xelekekêye xwe li hevdivegrîne, ji çandinî, sewaldar, kargeh û pêşesazî hev temam dike, jin jî vê xelekê bi awayîk sîstematîk bi keda xwe bi rêvedibe."

### PROJE PÊŞNİYAR KİRÎ PÊK TÊN

Horî da zanîn ku ew saleke ser avakirina bazara jin a binavê Papûla dixebitin û di 24'ê Gulanê de li Dêrikê bi merasîmekê hate vekirin û ser du salan peyman hate çêkirin û wiha dom kir: "Armanc ji bazarê em keysbaziya bazirganan bişkînin û jin li keda xwe xwedî derkevin, di heman demê de jî jin di beşê tîcarî de jî xwe xurt û bi rêxistin bike. Di




bazara Papûla de 21 dukan hene, hemû cûreyên cil û berg, pêlav, konsirwa, kozmetîk û şêrîngehên ku jin bi destên xwe çêkirine têne fiotin. Horî diyar kir ku hazirtiyên sûka jin li bajarê Amûdê û Serê kaniyê jî tê kirin. Ev bazarana wê ji ya Papûla cuda tir be, yanî di her sê bazarên jin bêne avakirin ev gavek pir girîn û serkeftî ye."


Horî di axaftinê de bal kişand ser hemleya çalakirina koopertafan ku ev 4 mehin hîn berdewam dike û got: "Hemle li Amûdê heye Dêrik û Tikoçer û gundewarên wê rêze civîn hatin çêkirn û wê li Kantona Qamişlo û Hesekê berdewam bike. Emê giraniyê bidin Hesekê ji ber ku berferhe û pir ereb lê hene, her wiha li Til Temir, Şeda û Til Birak jî projeyên aborî pêşbixin û wê navenda aboriya jin bê vekirin. Di encama hemleyê de hind, wekî Firine, jenetor û koperatîfa dukana bi navê Davoşka a kozmetîk, cil û bergên jinan di hundirê Qamişlo de hatiye vekirin û bi buhayek pir kêm tê firotin."

### BİRYARÊN NÛ Jİ BO ÇANDİNİYÊ

Horî Şemdîn rewşa kooperatîfên çandiniyê jî bi bîrxist û got: "Çandinî jiber kêmbûna baranê ne başbû, lê li Dêrik û Serê Kaniyê başe; ji bo ku em van rewşana derbasbikin biryarên nû wê hebin. Ji ber ku rêxistin tenê ser sê salan zevî dan ku em bikin kooperatîfên çandiniyê. Biryar jî wê li gorî rewşa zevî û hewayê be û ji bo pêşxistina tov jî saziyên analîzkirina axê hene, jiber ku ji nezanebûn û rewşa hewayî tov paşketiye, pêwîste em kalîteya tov pêşbixin."

Rêvebriya Navenda Aboriya Jin Horiya Şemdîn di dawî de got: "Dema hemle bi dawîbibe, wekî navenda aboriya jin raporek encamanameya vê hemleyê derxînin û radestî Yekîtiya Koperatîfa jin a Bakurê Sûriyê bikin."





## 1. salvegera rizgarkirina Tebqayê bi şahiyekê hate pîrozkirin

Yekemîn salvegera rizgarkirina Tebqayê bi şahiyekê hate pîrozkirin.

Bajarê Tebqayê yê li Bakurê Sûriyê, beriya niha bi salekê ji çeteyên DAÎŞ'ê hate rizgarkirin. Gelê wê piştî rizgarkirinê vegerî bajarê xwe. Bi vegera şêniyên bajêr re koçberan jî xwe li vî bajarî girtin. Niha bi hezaran koçber li Tebqayê dijîn. Koçber piranî ji herêmên Hema, Hûms, Îdlib û Helebê ne.

Mihemed Alxalid ku tevlî şahiya rizgarkirina Tebqayê bû, ji bajarê Hemayê ye. Nêzî saleke hatiye Tebqayê axivî û got: "Ji bo zarokên xwe hatim vir. Ne bes ji bo paşeroja zarokên xwe, lê gelek sedem hene. Li welatê me kar nîne, aramî û ewlekarî jî nîne. Ji xeyînî şer tiştek nemaye. Lewma me bihîst ku ev der ji her deverê ewletir e. Min jî rahişt sê zarokên xwe û berê xwe de vir."

Bajarê Tebqayê bi 55 kîlometreyan li rojavayê Reqayê ye. Li kêleka çem û gola Firatê ye. Li ber bendava Firatê hatiye avakirin. Cihekî stratejîk e ku bendava xwe elektrîkê dide hemû deverên Sûriyê. Tevî ku çeteyên DAÎŞ'ê xera kiribûn jî niha piştî sererastkirina wê elektrîkê dide gelek deverên herêmê û Bakurê Sûriyê…*ANF*

### Ronahî

## Li dijî yek zimanî pirr zimanî

Hesen KARASÛNGÛR

15'ê Gulanê Roja Zimanê Kurdî ye. Di serî de ev Roja Zimanê Kurdî li hemû kurdîhezan pîroz be.
Hêzên dagirker û mêtinger yek ji polîtîkayên ku hertim serî lê didin û dixwazin pêş bixînin polîtîkayên asîmîlasyonîst in. Armanca bingehîn ji asîmîlasyonê ew e ku hemû amûrên berxwedêr ji destê civakê bigire û civakên dîtir bişibîne xwe. Di serî de jî berê xwe dide ziman. Eger ziman bê fonksiyon bimîne û civak nikaribe bi zimanê xwe, xwe îfade bike ew ê bi rehetî bikaribe li ser serweriya xwe pêk bîne. Eger zimanê tê bikaranîn ne zimanê nivîskî be li hemberî polîtîkayên asîmîlasyonîst ên hêzên dagirker û mêtingeriyê nikare zêde li ber xwe bide. Her ku biçe li hemberî zimanê serdest ew ê nirxê wê wenda bike û bibe hacûc. Polîtîkayên asîmîlasyonîst ne tenê di warê çand, ziman û hunerê de tê pêkanîn li ser hemû saziyên civakî pêk tê.
Sê dewletên netewe Tirk, Fars û Ereb li ser çand û zimanê bindestan taybet jî yê kurdî polîtîkayên asîmîlasyonîst bi dijwarî meşandin. Armanca wan ew bû ku derveyî zimanê xwe hemû zimanên din ji holê rake û yek zimanî li ser civak, çand, nasname û zimanên cuda ferz bike. Ji bo vê jî derfetên ku ew zimanên bindest bikaribin li dibistanan perwerde pê bê dîtin ji holê rakirin. Li dibistanan encax çand û zimanê serdestan bihata fêrkirin. Her hewldaneke biçûk ya ji bo zimanê kurdî jî dihat astengkirin û weke sûcekî giran û mezin dihat dîtin.
Lê bi şoreşa Rojava re rewş hatiye guhertin. Tiştê ku şoreşê mezin dike û herî baş di nava civakê de dide rûniştandin perwerde ye. Hêzên mêtinger û dagirker bi sedan salan e nehiştiye gelê kurd bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne. Lê bi Şoreşa Rojava re gelê kurd ne tenê bi zimanê xwe perwerdeyê dibîne, çand, ziman û hunera xwe jî pêşde dibe, di heman demê de çand, ziman û hunerê din jî pêşde dibe û derfet dide ku her civak bi zimanê xwe perwerdeyê jî bibîne. Perspektîfa neteweya demokratîk rê û derfetê dide hemû çand, ziman û hunerên din bikaribe xwe pêşde bibe û xwe bi rêxistin bike. Rexmî ku li ser axa bakurê Sûriyê bênavber şer, êrîş û berxwedan heye jî perwerdeyek demokratîk tê pêşxistin. Hemû civakên li bakurê Sûriyê mafê xwe heye ku bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne. Bi sîstema perwerdeya li bakurê Sûriyê kurd, ereb, suryan her yek bi zimanê xwe perwerdeyê dibîne û her wiha zimanê hevdû jî fêr dibin. Di hundirê çend salên din de li bakurê Sûriyê sê ziman ew ê bê fêrkirin. Ev bi xwe şoreşeke mezin a demokratîk e. Ev çand û zimanên cuda ew ê ji hevdû hez bikin, qebûl bikin û bi awayekî demokratîk nêzî hev bibin. Di dîroka Rojhilata Navîn de û taybet jî di ya Sûriyê de tiştekî wisa nehatiye dîtin.
Hemû çand û ziman xwedî bi rûmet e û girîngiyek xwe heye. Dibe ku hinek ziman ji aliyê bi milyonan kesî ve weke zimanê perwerdeyê tê dîtin, dibe ku hinek ziman jî ji aliyê bi sedan kesan ve tê zanîn. Ev nayê wê wateyê ku zimanek di ser zimanekî din re ye. Hemû ziman çand û dîrok bi xwe ne.

# 24'ê Hezîranê divê bibe dawiya Erdogan

***Hevseroka Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Pervin Buldan diyar kir ku ger HDP di bendê de were hiştîn wê AKP zilma xwe li Tirkiyê zêdetir bike û got, "Divê dîroka 25'ê Hezîranê bibe dîroka bê Erdogan." Bûldan li ser tifaqa kurdan jî got, "pêwîste yekîtî û tifaqa kurdan tenê bi hilbijartinê ve sînor nemîne. Êdî dema kurd bi hev re tevbigerin û helwesta hevpar bidin hatiye."***



Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Buldan, diyar kir ku piştî desthilatê got "HDP'ê di sindoqan de veşêrin", zextên li ser HDP'ê wê zêdetir bibin û wiha got: "HDP wê bi nûnertiyek xurt serseftinê bi dest bixe. Divê bi qasî ku nikaribin me di sindoqan de veşêrin û dengê me bidizin dengê me zêde bin."
Hevseroka Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Pervin Buldan, derbarê hilbijartina Zordest a 24'ê Hezîranê, astengî û lîstikên li pêş HDP'ê û hewldanên ku dixwazin HDP'ê li derveyî meclîsê bihêlin ji Ajansa Mezopotamya (MA) re axivî.
Bûldan diyar kir 24'ê Hezîranê hilbijartina Serokomariyê û parlamenteriyê ji bo Tirkiye dê gelek kritik be û wiha got: "Li Tirkiyê yekem car hilbjartinek bi vî rengî pêk tê. Hilbijêr yekem car rastî modelek wisa tên. Ji destpêkê heta dawî bê qûralî hene. Di bin şertê ne adîl û ne wekhev de hilbijartin pêk tê. Polîtîkaya tirs û tepisandinê ya ku AKP dimeşîne li ser gelê Tirkiyê belav bûye. Di vê hilbijartinê de ewlehî zêde derdikeve pêş. Di bin şertê rewşa awarte de hilbijartin pêk tê. Hilbijartina ku di bin rewşa awarte de pêk bê ne rewa ye. Lê tevî hemû astengî, zext û zordariyên li ser hilbijêran em ê li tevahiya Tirkiyê ji bo ewlehiya sindoqan bi partiyên din re bixebitin. Em ê li sindoqan xwedî derkevin."

**EM Ê HEMÛ LÎSTIKAN XERA BIKIN**

Buldan, anî ziman ku partiyên îtîfaq ava kirin, armanc dikin ku HDP'ê li dervê meclîsê û di bin bendê de bihêlin û wiha got: "Lê tevî hemû lîstikan em xwedî hêzin ku lîstikan pûç bikin û astengiyên li pêş xwe rakin. Bê guman îtîfaqa hilbijartinê girîng e. Lê ya girîng ewe ku di çarçoveya demokratik û armamca pêşxistina demokrasiyê de pêş bikeve. Hem "Îtîfaqa Cumhur" hem jî "îtîfaqa mîllet" armanc dike ku HDP'ê di bin bendavê de bihêle. Parlamentoya bê HDP û Tirkiyeya ku vîna kurdan neyê dîtin demokratîk nabe. Ger ku HDP di bin bendê de bimîne tiştekî ku em winda bikin tune. Ya ku winda bike civaka Tirkiye û Tirkiye bi xwe ye. Ger ku HDP winda bike wê hêjmara parlamenterên AKP'ê zêde bibe. Wê hêza AKP'ê zêde bibe. Ji ber vê yekê dîsa wê di pergala yek zilam û zordest de tiştek neyê guhertin.

**DIVÊ TIFAQ BI HILBIJARTINÊ RE SÎNOR NEMÎNE**

Buldan da zanîn ku pêwîste yekîtî û tifaqa kurdan tenê bi hilbijartinê ve sînor nemîne û wiha got: "Ji bo ev tifaq piştî hilbijartinê bidome, me hevdîtinên girîng kir. Êdî dema kurd bi hev re tevger bikin, helwesta hevpar bidin û gotinên xwe bêjin hatiye. Gelek partiyên Kurdistanî bi taybetî biryar girtin ku wê HDP'ê destek bikin û ev li nav raya giştî jî belav bû. Hê jî hevdîtin dewam dikin. Wê heta çend rojan ev hevdîtin bigîhîjin encamê û wê ji raya giştî re bên eşkerekirin. Ev hevdîtin ji bo gelê kurd gelek girîng in."

**DÊ DÎROKEK BÊ ERDOGAN DEST PÊ BIKE**

Buldan diyar kir ku 24'ê Hezîranê ji bo siberoja Tirkiyê dîrokek girîng e û got: "Yekemîn car e ku Tirkiye wê biryara pergala serokatiyê bide. 24'ê Hezîranê meseleya man û nemanê ye. Em hêvîdar in hemû kes wê piştevaniya aştî û demokrasiyê bike. Yanî wê ji faşîzmê re bêjin 'erê' yan jî wê biryara jiyanek azad û wekhev û biratiyê bidin. Divê dîroka 25'ê Hezîranê bibe dîroka bê Erdogan."

# Gel û HDP wê bersiva pêwîst bidin



Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen anî ziman ku encama jinedîtîhatina HDP'ê wê rê li ber hevsengiyeke nû veke û diyar kir ku encama tûra duyemîn wê ji aliyê dengdêrên HDP'ê ve diyar bibe.
Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen li navenda giştî ya partiya xwe civîneke çapemeniyê pêk anî û rojeva heyî nirxand. Bîlgen da zanîn, nêzî 1500 kesî ji bo bernamzetiyê serî li wan dane û nîvê van jin in.
Bîlgen da xuyakirin ku AKP kampanya xwe ya hilbijartinê bi destê wezîfedarên dewletê ve dimeşîne û got, "Eger walî radibe tevî rêveberê bajar û navçeyan ê partiya li desthilatdariyê digere, hêza dewletê bi kar tîne û li dijî partiya me kampanyayê dimeşîne, wê çaxê divê mirov bi bîr bîne ku ev yek tebîeteke sîstema yek partiyê ye."
Ayhan Bîlgen diyar kir ku wê 14'ê Gulanê roja Yekşemê danezana xwe ya li ser hilbijartina giştî û hilbijartina Serokkomariyê ji raya giştî re eşkere bikin û ev yek wê ji bo demokrasiya ji gelek partiyan pêk tê, bibe demeke girîng.
Bîlgen destnîşan kir ku ya çarenûsa rêveberiya Tirkiyê diyar bike, hilbijartina parlamenteran e û got, "Eger mûxalefet li parlamentê serdest be, ev yek wê çarenûsa tûra duyemîn a hilbijartina Serokkomariyê jî diyar bike. Wê ji bo 8'ê Tîrmehê bibe hêvî.
Em pê bawer in ku namzetê me yê Serokkomariyê hem ji aliyê dewrkirina erkê ve, hem jî di mijara afirandina destûra bingehîn a demokratîk de wê gotineke xurt bêje."

**BANGA LI DENGDÊRAN**

Bîlgen bang li hemû dengdêran kir ku ji bo ewlekariya sindoqan, ji bo nîşandana îradeya dengdêran heta 12'ê Gulanê bi erk û berpirsyariya xwe ya qeyda sindqona û lîsteya dengdêran rabin.
Bîlgen anî ziman ku li dijî hêzên ku dixwazin HDP'ê ji parlamentê derxînin, wê roja dengdanê bersiv bê dayin û got, "Li gel ambargoya medyayê û hewldanên krîmînalîzekirinê jî, em pê zanin ku gel wê bersiva pêwîst bide."
Bîlgen ragihand ku wê namzetên parlamenteriyê jî roja 22'ê Gulanê bi raya giştî re parve bikin û got, "Destpêkê wê beyannameya jinan bê parvekirin. Piştre wê namzet bên nasandin. Dûre kampanya me, mîtîngên me wê dest pê bikin."

**ENCAMA HILBIJARTINÊ DI DESTÊ DENGDÊRÊN HDP'Ê DE YE**

Bîlgen wiha dewam kir, "Di her halî de encama tûra duyemîn wê di destê dengdêrên HDP'ê de be. Derdê me ne ew e ku em xwe gelekî mezin bibînin. Yên ku ji nedîtî ve tên, yên ku heqaret li wan tê kirin, nûnerên wan ên hilbijartî hatine girtin, bêguman wê îradeya xwe ya polîtîk di hilbijartinê de nîşan bidin. Ne tenê desthlatdarî, wê partiyên din ên mûxalefetê jî êvara 24'ê Hezîranê bibînin bê encameke çawa wê derkeve holê. Ji bo her kesî wê encameke balkêş be. Jinedîtîhatina HDP'ê, wê weke encama rabûna li ber vê neheqiyê rê li ber hevsengiyeke nû veke. Em ji niha ve dibêjin ku yê encama tûra duyemîn diyar bikin em in. Kampanya me wê li hemberî her şêwe zext û astengiyan bidome."

# Dengên ji bo HDP'ê wê faşîzmê têk bibe




KCDK-E bang li hilbijêran kir ku qeyda xwe çêbikin û got; "Her dengê ku hûn bidin, wê tifaqa faşîst û kujer AKP-MHP'ê têk bibe."
Dîwana Hevserokatiyê ya Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) têkildarî hilbijartinên 24'ê Hezîranê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
KCDK-E bal kişand ser girîngiya hilbijartinên 24'ê Hezîranê ji bo têkoşîna demokrasî û azadiyê û ev peyam da; "Her dengê ku em ji bo têkoşîna azadî û demokrasiyê bidin, wê tifaqa faşîst û kujer a AKP-MHP'ê asteng bike."

**DIVÊ HER KES DENGÊN XWE BIDE**

KCDK-E di daxuyaniyê de ev tişt got; "Her dengê ku bi têgeha 'bi dengê min tiştek naguhere' neyê dayin wê bê wateya piştgiriya ji bo rejîma Erdogan. Di van hilbijartinan de her dengê ku neyê dayin tê wateya piştgirîdayîna tifaqa faşîst û takekesî ya rejîma AKP-MHP'ê. Her dengê ku were dayin dikare pêşî li komkujiyan bigire, derfetên serketina Demîrtaş û HDP'ê zêde bike.

**2 ROJ AN EM SEFERBER BIBIN**

Ji Ewropa heta DYA, ji Kanada heta Efrîqayê, ji Japonya heta Awûstralyayê divê hilbijêrên ku qeyda xwe nekirine qeyda xwe bikin. Divê her kes ji bo van 2 rojên qeydê bi ruhê seferberiyê kar bike. Em dizanin ku di van hilbijartinan de dengên li Ewropayê wê qedera hilbijartinan diyar bike. Wê demê bi şîara 'divê kes bê qeyd nemîne' û lêpirsina hilbijêran li hemû meclîs û komîsyonên hilbijartinê bibe rojev û xebat bê kirin."



# 28 jin hatin kuştin û revandin

***Kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê bê navber li ser welatiyan didomin. Di nava mehekê de 28 jin rastî destdirêjî, kuştin û revandinê hatin. Çeteyên dewleta Tirk li Efrînê mîna DAIŞ'ê desmalên seriyan û kincên reş li ser jinan ferz dikin.***



Di mehekê de 28 jinên Efrînê ji aliyê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê rastî kiryarên kuştin, revandin û tecawizkirin hatin. Her wiha çeteyan desmalên seriyan û cilên dirêj li ser jinan ferz kirin.
Artêşa Tirk a dagirker li Kantona Efrînê mafên jinan (di nav de jinên ducanî) binpê dike û li dijî hemû kiryarên hovane wek kuştin, revandin û tecawizkirin pêk tîne.
Her wiha artêşa dagirker û çeteyên wê di bin navê Islamê de rêbazê DAIŞ'ê bi kar tînin, desmalên seriyan û cilên dirêj li ser jinên Efrînê ferz dikin.
Di encama topbaran û bombebarana artêşa Tirk a dagirker a li ser Kantona Efrînê de, 800 sivîl (di nav de 93 jin) birîndar bûn. Her wiha 228 sivîl (di nav de 28 jin) şehîd bûn.
Piştî ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê Kantona Efrînê dagir kirin, di mehekê de 28 jin (di nav de jineke ducanî) ji aliyê artêşa dagirker ve rastî kiryarên kuştin, revandin û tecawizkirinê hatin. Her wiha artêşa dagirker heman rêbazê DAIŞ'ê bi kar tîne, desmalên seriyan û cilên dirêj li ser jinan ferz kirine.
Li gorî nuçeya di da ajansa ANHA'yê de di mehekê de 6 jin hatin tecawizkirin, 21 jin hatin kuştin û revandin.
Li gor ajansa ANHA'yê ji gundê Selûrê yê herêma Cindirêsê beriya demekê artêşa Tirk jinek li gundê îşkence û tecawiz kirin, ji ber ku qebûl nekiriye ku li gorî fermanên wan tev bigere.
Di 20'ê Nîsanê de artêşa dagirker jina ciwan a bi navê Zozan Beşîr Silêman a ji gundê Kefer Sefrê ya herêma Cindirêsê li ser benda kontrolê ya Tirindê (dema ku bi malbata xwe re vedigeriya Efrînê) revandin. Malbata Zozan diyar kir ku keça mamosteya sporê bû, ji ber vê yekê çeteyan wê bi tawana terorê revandin.
Çeteyan jina ciwan bi navê Xedîce Riyad (21) a ji navçeya Şiyê jî revandin. Xedîce zewicî ye û ducanî ye. Lê ji ber hovîtiya çeteyan zaroka wê ji ber çû. Malbata Xedîce bang li civaka navneteweyî kir ku keça wan ji destê çeteyan rizgar bikin û kiryarên hovane yên li dijî sivîlan rawestînin.
Li maleke gundê Korka ya jorîn a girêdayî navçeya Mabata cenazeyê jineke 30 salî hat dîtin. Li ser laşê jinê şopên îşkenceyê hatin dîtin û nasnameya wê nehat naskirin.
Li gundê Şîtka ya navçeya Mabata çeteyên dewleta Tirk du jinên ciwan tecawiz kirin û 13 jin jî bi hinceta lêpirsînê revandin. Her wiha çeteyan ji gundê Ibêdan ê navçeya Bilbilê jî 3 jin revandin.
Çarenûsa jinên hatîn revandin nediyar e.
Di çarçoveya hovîtiyên dagirkeriya Tirk û binpêkirina mafên jinan de, 3 jinên negihayî ji aliyê çeteyan ve hatin tecawizkirin. Hat gotin ku çete guharên jinan ji guhê wan derdixin û ji xwe re dibin.
Hat ragihandin ku jinên Efrînê nikarin ji malên xwe derkevin û ji tirsa cilên dirêj ji mal de jî li xwe dikin.
Her wiha çeteyan jinên bi navên Emîne Elî ji navçeya Meydana, jina bi navê Leman û jina bi navê Mewlîde ji taxa Eşrefiyê ya bajarê Efrînê revandin.
Derbarê mijarê de Endama Koordînasyona Kongreya Star a Efrînê Fatma Lekto da zanîn ku ji ber hovîtiya artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî jinên Efrînê, gelek zarok bê dayîk man û wiha got, "Rewşa şer û hovîtiya çeteyan bandoreke mezin li ser psîkoljiya jinan kir. Tevî vê yekê jî rêxistinên mirovî yên jinê tu destekê nadin jinan."
Fatma diyar kir ku ew ê hemû binpêkirinên artêşa Tirk a dagirker ên ji mafên jinê û zarokan belge bikin û pêşkêşî rêxistinên jinan bikin…*ANHA*

# Cara 75'an daxwaza hevdîtinê hat red kirin

Daxwazên serlêdana Dozgeriya Bursayê yên ji aliyê malbata Rêberê Gelê kurd Abdulah Ocalan û malabtên sê girtiyên din cara 75'emîne tê redkirin.
Bi salan e, malbatên girtiyên li Îmraliyê daxwazên dîtina xizmên xwe dikin. di vê hefteyê de jî cara 75'emîne ku malbata Rêberê Gelê kurd Abdulah Ocalan û malbatên 3 girtiyên din ji bo hevdîtinê serî li Serdozgeriya Komarê ya Bursayê dan.
Ji malbata Abdullah Ocalan Mehmet Ocalan û Fatma Ocalan ji bo bi birayê xwe Rêber Abdullah Ocalan re li Girtîgeha Îmraliyê hevdîtinê bikin, cara 75'emîn bi riya parêzeran serî li Serdozgeriya Komarê ya Bursayê dan.



Malbatên girtiyên din ên li Îmraliyê birayê Hamilî Yildirim, Polat Yildirim, birayê Omer Hayrî Konar, Alî Konar û xwişka Veysel Aktaş, Sabiha Aslan jî bi riya parêzerên xwe serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrasyê dan.
Ji 11'ê Îlona 2016'an û heta niha 75 carin serlêdanên malbatan hatin redkirin.

# Divê ciwan têkoşînê bilind bikin

Yekîtiya Ciwanên Rojava civînek berfireh ji ciwanên bajarê Hesekê re lidar xist.
Bi sedan ciwanên ji hemû pêkhateyan, nûnerên YPG û Hêzên Asayîşê jî di civîna ku li salona Salam a li bajarê Hesekê hate lidarxistin de amade bûn. Di civînê de Cîgirê Hevserokatiya Kantona Hesekê Dawid Hecî Numan axivî û geşedanên dawî yên li herêmê nirxandin.
Hecî Numan di axaftina xwe de diyar ku tevahiya Rojhilata Navîn bûye armanca hêzên sermeyadar û got: "aramancgirtina Sûriyê ne ji valatiyê hatiye. Şoreşa Sûriyê ji xeta xwe ya aştiyane derketiye, gelek hêzên derve destwerdana şoreşa Sûriyê kirine. Vê yekê jî alozî hîn zêdetir Kûr kiriye."
Hecî Numan, di berdewama axaftina xwe de bibîr xist ku dîrok xwe careke din dubare dike û wiha pê de çû: "Beriya sed salî, şerê cîhanê ya yekem li ser bingeha nakokiyan pêk hat. Lewma tiştê niha em dijîn, şerê cîhanê yê sêyemîn e."
Numan bal kişand ser xwedîderketina gel li xwe û got: "Em xwe naspêrên tu hêzan, hêza me heye. Li tevahî herêmên Bakurê Sûriyê çete têk çûn. Koalîsyona Navdewletî jî di şerê li dijî çeteyan bû hevkarê me, ew ne hêza sereke bû. lewma çi hêz dikişe an nakişe zêde ne pirsgirêke, pirsgirêk ew e em têkoşînê xurt bikin."
Piştî axaftin bi dawî bû, ciwanan mijarên rêxistinî gotubêj kirin.
Di nav gotubêjan de lawazî û pirsgirêkên ciwanan di rêxistinkirina



civakê de cih girtin û bal hat kişandin ser rola pêşeng ya ciwanan.
Di dawiya civînê de plana 6 mehan hate diyarkirin. Di nava xebatên ku dê pêk werin de vekirina dewreyên perwedeyan bûn. Her wiha avakirina tabûrên taybet ên ciwanan, çêkirina komîteyên çandê li navenda ciwanan, semîner û sînevizyon derbarê tekoşîna li dijî tiryak û madeyên hişbiriyê dê werin pêşkêşkirin. Wê ciwan ji bo tevlîbûna YPG û QSD'ê werin rêxistinkirin.

# Dewleta Tirk bombeyên qedexekirî bikartîne



Artêşa Tirk a dagireker li herêmên başûrê Kurdistanê çekên qedexekirî bikar tîne.
Di Roja yekê Gulana 2018'an bi balafirên şer bombe li holikên gundiyên Şuşane yê li herêma Bradostê barandin. Balafirên şer ên Tirk bombeyên xarik (mîsket) ku li gorî peymanên navneteweyî qedexe ne, barandin.
Artêşa Tirk a dagirker ku li herêma Bradost-Xakurkê derbên giran ji gerîlayên HPG û YJA Starê dixwe, bi topên hawanê û balafirên şer deşt û zozanên ku gundî havînê lê dimînin bombebaran dike.
Di roja yekê Gulanê li gundê Şuşane yê li herêma Bradostê bombebaran hate kirin. Eşkere bû ku balafirên şer ên Tirk bombeyên xarik (mîsket) li herêmê barandine. Li gundê ku balafirên şer ên Tirk bombe lê barand, bombeyên xarik hatin dîtin ku hinek ji wan li gorî dema hatiye eyarkirin diteqe, hinek jî bi pêjnê diteqe.
Ev cureyê bombeyan li gorî peymanên navneteweyî qedexe ne. Beşek ji van teqiyan e, hinek jî hê neteqiyan e û li nava wan erdan ne.

### Çare



## Nexapin

Sîpan CAN

Çi buyer û rûdan, daxuyanî, şer û êrîş rûdidin sedemek wê ya rasterast heye û ya dûr heye. Ji ber vê yekê gelek kes, alî, pispor van buyeran şîrove dikin. her kesek li gor fêmkirina xwe ji meseleyan re heya radeyekê van buyeran ji hev vediqetîne û mîna rês û hiroyê vedinpincire; lê pêwîste piştî wê mirov bikaribe baş nirxandinê bike û hema li gora kê çi gotî çi ezbere neke, ango gelek kesên dinrxînin an xwe dixapînin, an jî tiştek fêm nekirine, an jî haya wî ji bayê felekê tune ye.
Em dikarin di roja me ya îro de hin mînakan bidin. Berî çend rojan û heya niha rojeva cîhanê peymana nûklerî ya Îranê ye û vekişandina Amerîkayê jê ye. Her kes azad e bêje ka bê çima ev tişt buye, û her kes jî mafê analîzekirinê ji bo wî heye. Lê dema mirov ji rastiya gelek tiştan bi dûr dikeve ew dibe xwexapandin. Em bêjin, di vê vekişandinê de hema hin kesan gotin " Îran wê bikeve, Îran ne xwediyê wê hêzê ye" lê divê em zanibin dewletekî mîna Îranê ne Gengaze ku bi van lîstik û fenên Amerîkayê bikeve. Ev tiştekî ne hêsan e. Ji ketin û ne ketina Îranê an jî ji ketin û ne ketina Tirkiyê zêdetir divê ku em bandora van siyasetan li ser welatê xwe şîrove bikin. An jî çima di vê demê de mijaerekî wekî Îranê kirin Rojevê, armanc jê çiye?.
Rojhilata Navîn bi qeyrana ku tê de dijî, gelek tabloyên ne temamakirî bi xwe re tîne der. Ev tablo jî pêşeroja wê ye.
Ji ber wê çi dibe bila bibe, divê zû bi zû bi hin agahî û daxuyaniyên di derbarê herêmê de nexapin. Ango dema buyerek tê şîrovekirin dibe ku bingehekî wê yê zanistî û li ser lêkolîn hatibe kirin û di derbarê wê mijarê şîrovekar xwedî zanebûnekî siyasî û dîrokî be.
Ji ber sedemên ku hatine diyarkirin. Em dibînin ku di van mijarên ku çarenûsa herêmê diyar dikin de, ji şîrove zêdetir, dubarekirina agahî û duxuyaniyan tên dayîn. Ji ber vê, siyasetmedar dibe an jî rojnamevan be, an heya şîrovekarek be jî dîsa dikevin xefika rojeva xeynî xwe û bi wê bandor dibin.
Em dirêj nekin; lê her tiştekî dibe û li ser şîrove tê kirin. Di asta herî bilind de bandora wê li ser civakê dibe. Lewma divê ne em xwe û ne jî hemwelatiyên xwe bixapînin. Divê em xwe ji vê yekê êdî biparêzin.